# Enfal û Qiriyan

Selah Zero

**Selah Zero**

Enfal di ezmanê erebî de bîte û (şelandin û talankirin), ev karê şelandinê û talankirinê berbelav bû di nav civakên rojhelata naverast de. Lê qiriyan û talankirina mirova jêk hate ser li çerxên burî de heta çerxê bîstê, piraniya van enfala bi serê milletê Kurdistanê de hatiye bi destê rijêmên dorûbera (EcemaTurikaEreba). Û enfal dihate bikarînan yan li ser astê welatiyê yan jî bê neteweyê, bi hizaran ji ermeniya û aşuriya, êzîdiya, kildana û kurda bûne qurbaniya wan enfala, heta îro jî ev janên giran yên wan bîrhatina di leşê vî milletî de mane. Îro hindek pirsiyar pêwîstin car dî bête gotin:

Çend enfal û qiriyan bi serê milletê Kurdistanê de hatîne?

Qiriyana milletên Kurdistanê ji hemî ola gehaye çendê?

Erê mêjûwa wan enfala û qiriyana hat'ye nivîsîn? Heger bersiv hebe ne dûre gelekî lawaz be, çinku em wek rewşenbîr yan dezgehên mîrî, paşî bi şaşiyên xwe dihesîn. Û qedera ya ji hemiya mezintir em mêjûwa xwe ji zardevê xelkê biyanî werdigirîn. Me îro çi pêwîst e? Em bihêyin ev mêjûwe li gel milletî binax bibe? Û em ji bîr bikîn û bihêlîne bi hêviya xelkê biyanî ve? Yan jî em rabîn ser xwe û ji xewa giran rabîn, em mêjwa xwe bi destê xwe binivîsîn. Lê çi pêwîste da mêjûwekê rast û dirust bête nivîsîn?

1- Ji hikumeta Kurdistanê dest pê dike.

2- Girupek bo karê komkirina vê mêjûwê bihê danan. Ji rewşenbîra û danemira ewên qiriyan bi serê dey û babên wan hatîn.

3- Destkariya siyasî dûr be ji karê vê girupî.

4- Tirs û şerm di karê vî girupî de nebe.

5- Ala rastiyê û yeksaniyê û dilpakiyê armanca endamên vî girupî be.

Heger hindek mercên baştir hebe dê bihêztir be ev kare. Û piştî ev kare bi dumahîk bêt û pertokek bi navê (enfal û qiriyanên bi serê milletê Kurdistanê de hatîn) pêwîst e ev pertuke bibe pirogramekê serekî û bête xwandin li hemû xwandingehên Kurdistanê, da zarokên Kurdistanê dijminên xwe biniyase, ka çi bi serê dey û babên wan hatîne? Û bi destê kê?

Ez car dî dixwazim ji hemû cihên peywendîdar û ji dezgehên mîrî mêjûwa vî milletî bihête nivîsîn, evro dest pê bikin çêtire ji subehî.